


Thursday 2nd August 2012

Geran

- Destpêk
- Nûçe
- Raport
- Kurdistanî
- Aborî
- Hewpeyvîn
- Huner û Kultur
- Civakî
- Pirreng
- Spor
- Dosya
- Gotar
- Teknolojî
- Arşiv
- Derbarê Me
- Peywendî

Peşêw: Divê xêr û bereketa Kurdistanê bo hemû welatîyan be



07/05/2012

Hewlêr: Şaîrê navdar ê kurd Ebdulla Peşêw di şevşahiyeke helbestan de ku li bajarê Hewlêrê hat saz kirin, got: "Divê xêr û bereketa Kurdistanê bi ser hev welatîyan de bê dabêşkirin."

Doh êvarê di şevşahiyeke helbestan de ku li Salona Pêşewa ya bajarê Hewlêrê hat saz kirin, şaîrê navdar ê kurd Ebdulla Peşêw çend helbestên kevin û nû yên xwe xwendin.

Di şeva helbestan de gelek nivîskar, rewşenbîr, xwendekar û hev welatî amade bûn ku ji zû de dengê Peşêw nebihîstibûn. Peşêw, di destpêka axaftina xwe de derbarê metirsiya li ser zimanê kurdî de axifî û bang li hemû kurdan kir ku li hemberî jinavçûna zimanê kurdî rawestin.

Di beşekî din ê axaftina xwe de Ebdulla Peşêw li ser rewşa Kurdistanê jî rawestiya û wiha axifî: "Ez li dijî hemû eqliyeteke Stalîn im, divabû 20 sal berî niha bo Kurdistanê destûreke hebûya, lê çênebû, berî çend salan jî min qala wê yekê kir ku divê leşkerêkî yekgirtî yê Kurdistanê hebe ji Zaxo heta bi Xaneqînê biparêze.

Peşêw wiha dirêjî bi axaftina xwe da: "Ez herdem li wê yekê difikirim gelo çima em dikevin danûstandinê ligel dagîrkerên welatê xwe, wek em bibêjin me jin bi hev daye telaqdan, danûstandinên me bi maçê dest pê dikin û bi maçê bi dawî dibin. Divê danûstandinên me ligel dakîrkerên welatê me li ser asata neteweyî bin, ne wek hizib û mizib û pêkhate û mêkhate."

Peşêw axaftina xwe wiha qedand: "Pêwîst e bîmeya bêkariyê bo bêkaran hebe, neku bo kesekî hebe û ji bo kesekî nebe. Herwiha her zarokekî ku li Kurdistanê çavê xwe veke, divê mafî wî/wê hebe, ev welat yê hemûyan e û xêr û bereketa wê jî divê bo hemûyan be."

Şandina koment

Nav: [input field]
Komênt: [input field]



Yên Pir Xwendî Zêdetirîn Koment

- Newroza: Dixwazim gelên biyani jî guhê xwe bidin stranên min
- Şakîra û Doçke meha dahatû digihin Kurdistanê
- Li Tirkiyê wesayeta leşkerî qediya ye û bihar hatîye welat ê min!!
- Veronica Kurdan bi Brezîlyan dide nasandin
- Du ciwanên Kurd pasaporta Kurdistanê amade dikin

Hewpeyvîn



BDP-ê li Hewlêrê nûnertiya xwe vekirîye lê hê mohleta fermî wemegirtîye

"Mebesta şandina petrolê bo Tirkiyê dabînkirina pêdiviyên



Kurdistanê ye"



"Ne artêşa azad, ne ya rejîmê û ne ya Tirkiyê nikarin bèn navçeyên Kurdan"

Dengdan

Neîna we çîye beramber bi websîteya Basê

Pir baş e

Baş e

Nebaş e

Dengdan

Bas newspaper на Facebook


Мне нравится 1

Bas newspaper

http://bas-news.net/ArticleDetail.aspx?articleid=1231

بازاری وەلام

Социальный плагин Facebook



Şandin

[Destpêk](#) | [Arşiv](#) | [Derbarê Me](#) | [Peywendî](#)

NORTITECH